# Qehwexane û Rewşenbîr: Tesîra Qehwexaneyên Kurdan ên Stenbolê li ser Geşedana Neteweperwerîya Kurdî*

## Coffeehouses and Intellectuals: The Impact of Istanbul Kurdish Coffeehouses on the Development of Kurdish Nationalism

**Ömer Fırat BAVLİ**

Ömer Fırat BAVLİ | https://orcid.org/0000-0002-9448-0564| omerfiratbavli@gmail.com
PhD. Candidate at Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Türkiye, Department of Kurdish Language and Culture, Mardin, Turkey

**Citation:**

Bavli, Ö, F. (2024). Qehwexane û Rewşenbîr: Tesîra Qehwexaneyên Kurdan ên Stenbolê li ser Geşedana Neteweperwerîya Kurdî. *Nubihar Akademî* 21, 103-122. DOI: https://doi.org/10.55253/2024.nubihar.1491028.

| | |
|---|---|
| Submission Date | 27.05.2024 |
| Acceptance Date | 25.06.2024 |
| Publication Date | 30.06.2024 |
| Peer-Review | Double anonymized - Two External |
| Ethical Statement | It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited. |
| Plagiarism Checks | Yes – iThenticate |
| Conflicts of Interest | There is no conflict of interest between the author and any parties in the article. |
| Complaints | The author(s) has no conflict of interest to declare. |
| Grant Support | The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research. |
| Copyright & License | Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the **CC BY-NC 4.0**. |

* Kurteya vê gotarê di Sempozyûma Navneteweyî ya li Ser Ziman, Edebîyat û Zanistên Civakî -1- ya 05. 05. 2024an de hatîye pêşkêşkirin.

**Puxte**

Qehwexane, li Rojhilata Navîn ji sedsala 16emîn û vir ve yek ji mekanên sereke yên jîyana civakî ne. Ligel hevdîtin û suhbetan ji bo mirovan yek ji fonksîyona herî giring a qehwexaneyan berbelavkirina agahî û ramanan e. Ji ber vê yekê zemîna ku qehwexaneyan ava dikir ji bo rayedarên sîyasî tim dibû sedema endîşeyan. Weke encameke vê endîşeyê pêrgî qedexe, astengî û cezayan hatin, lêbelê dîsa jî heta îro hebûna xwe domandin. Di sedsala 19emîn de li Dewleta Osmanî qehwexane yek ji qada giştî ya herî bitesîr bû. Qehwexaneyên vê serdemê di veguherînên sîyasî û civakî de rolên girîng leystin. Di dawîya sedsala 19emîn û destpêka 20emîn de li Stenbolê gelek qehwexane hebûn ku weke qehwexaneyên kurdan dihatin naskirin. Ev qehwexane ne tenê ji bo hevgirtin û danûstandinên civakî, ji bo çalakî û xebatên rewşenbîran jî wargeh bûn. Di geşedana neteweperwerîya kurdî de rola qehwexaneyan di vegêranên otobîyografîk de bi awayekî zelal tê dîtin. Armanca vê xebatê vekolîna tesîra qehwexaneyan a li ser geşedana netewewerîya kurdî ye. Di vê xebatê de tesîra van qehwexaneyan bi rêya otobîyografîyên Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa û Nûrî Dersîmî hatîye vekolîn. Di encamê de tê dîtin ku qehwexaneyên serdemê yên Stenbolê di geşedana neteweperwerî û rewşenbîrîya kurdî de xwedan tesîreke dîyar in.

**Peyvên Sereke**

Rewşenbîr, qehwe, qehwexane, neteweperwerî, qada giştî.

**Abstract**

Coffeehouses have been one of the most important places in social life in the Middle East since the 16th century. In addition to meeting and chatting, the most important function of coffeehouses is the dissemination of information and ideas. For this reason, the ground created by coffeehouses caused concern among rulers. As a result of this concern, they were banned, prevented and penalized, yet they have continued to exist until today.  In the 19th century, the coffeehouse was one of the most important public spaces in the Ottoman Empire. The coffeehouses of the period played important roles in social and political transformations. In the late 19th and early 20th centuries, there were many coffeehouses known as Kurdish coffeehouses. These coffeehouses were a base not only for solidarity and social relations but also for the activities and work of intellectuals. The role of coffeehouses in the development of Kurdish nationalism is clearly visible in autobiographical narratives. This study aims to examine their influence on the development of Kurdish nationalism. In this study, the influence of coffeehouses is analyzed through the autobiographies of Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa and Nûrî Dersîmî. As a result, it is seen that the coffeehouses of the period in Istanbul had a significant impact on the development of Kurdish nationalism and intelligentsia.

**Keywords**

Intellectual, coffee, coffeehouse, nationalism, public space.

## Destpêk

Stenbola sedsala 19emîn ligel entelîjansîyaya kurdî, wargeha qada giştî ya polîtîk a kurdan e jî. Qehwe -û pê re jî qehwexane-piştî ku gihîşt paytexta Osmanî, bû navenda gelek nîqaş û guherînan. Qehwexane qadeke giştî ava kir ku gelek caran ji alîyê rayedarên sîyasî ve dibû hedef. Habermas (2004, r. 95) qada giştî (public space) wiha terîf dike: "Ew qad e ku dikare tê de raya giştî were çêkirin." û ev qad bo hemû endamên civakê vekirî ye. Di destpêkê de yek ji sedemên sereke yên hedefbûna wan jî ev fonksîyon bû ku sînorên çînên civakî ji holê radikir. Şûnde endîşeyên sîyasî bêtir derketin pêş, ji ber ku wek mekanên girseyî ev cih dibûn navendên nerazîbûnê yên li hember otorîteyê. Rayedar van deran weke navendên galegalê dizanîn û vê yekê dikir ku li hember van deran tedbîran bigirin. Huvîyeta qehwexaneyan di sedsala 19emîn de piştî berbelavbûna rojnemayan cudatir bûn, di serî de ne xwedan fonksîyonek bi vî rengî bin jî di dawîya sedsala 19emîn de û di destpêka sedsala 20emîn de qehwexane yek ji mekanên sereke yên qada giştî ya polîtîk bû. Di heman demê de di prosesên veguherînên civakî û polîtîk de bûn yek ji hêmanên sereke.

Di dawîya sedsala 19emîn û destpêka sedsala 20emîn de kurdên Stenbolê xwedan jimarek berçav bûn. Piranîya wan mêr bûn û ji xwendekar û xebatkaran pêk dihat ku ji Kurdistanê hatine anku mişterîyên potansîyel ên qehwexaneyan bûn. Kurdên Stenbolê bi reflekseke xwe-parastinê xwe bi qehwexaneyan digirtin ku xwedîyên wan kurd bûn. Ev yek bes ne tercîhek çandî, di heman demê de bo kesên koçber zarûretek bû. Qehwexaneyên kurdan ên Stenbolê ji bo kurdên ku ji welatê xwe dûr, cihê têkilî û hevgirtinê bûn.

Qehwexaneyên serdemê ji bo kurdên koçber ne tenê mekanên kêf û suhbetên şevbihêrkê bûn. Li wê derê di heman demê de danûstandinên ramanî dihat kirin. Nerazîbûna li hember otorîteyê, li van deran dihatin bilêvkirin. Ji ber vê yekê qehwexane ji bo rewşenbîrên neteweperwer ên kurd, qadên xwezayî yên xebatên propaganda û rêxistina tevgera neteweyî ya polîtîk bûn.

Mîrektîyên kurdan ku demeke dirêj li Kurdistanê desthilatdarî bi dewleta Osmanî re parve dikirin, di nîveka sedsala 19emîn de hatibûn hilweşandin. Endamên malbatên rêveberên van mîrektîyan li Stenbolê nefîkirî bûn. Entelîjansîyaya modern a kurdî bi xebat û pêşengîya vê nîfşa elît, li Stenbolê peyda bû. Hîmên neteweperwerîya modern a kurdî jî dîsa li Stenbolê hatin avêtin. Nifşa pêşîn a entelijansîyaya kurdî, di bin bandora mixalefeta împaratorîyê ya giştî de bû. Di dawîya sedsala 19emîn de û di destpêka sedsala 20emîn de paytexta Osmanî wargeha hemû entelejansîyayên kêmaran bû. Parçe parçe hemû komên cuda li hember otorîteya padişah bi giştî mixalefetê pêk dianîn. Di serdema îstibdata Abdulhemîdê 2yem de rêxistinbûn ne mimkun

bû, ji ber vê jî rojnameya yekem a kurdî ji Stenbolê dûr, li Qahîreyê dest bi weşanê kir. Ne xwedan perspektîfeke seperatîst be jî padişah dixwest hemû hewldanên bi vî rengî qedexe bike. Rêxistinbûna netewerperwerên kurdî bi rêya civînên veşartî pêk dihat, dikare were gotin qehwexaneyên kurdî cihên tekane bûn ku hemû kurd bikarin xwe bigihînin wê. Ev rewş bo mixalefeta giştî jî wisa bû, ew jî qehwexane wek qadên xebatê bi kar dianîn.

Kurdên Stenbolê hem ji welat dûr bûn hem jî tu sazîyeke fermî –cemîyettune bû ku wan bigihîne hev. Di pêvajoya nebûna sazîyên civakî de qehwexane di heman demê de klûbên civakî yên polîtîk bûn. Ji bo neteweperwerên modern ên serdema ewil qehwexane qadên parvekirina ramanên wan bûn, nêrînên wan bi rêya van mekanan digihîştin girseyan. Ji bo kurdên Stenbolê qehwexane qada giştî ya sereke bû li dîasporayê. Li Kurdistanê jî helbet qehwexaneyên bi vî rengî hebûn, lê derbarê fonksîyona wan a civakî û polîtîk de agahîyên me sînordar in. Li qehwexaneyên Kurdistanê xebat û propagandayên polîtîk piştî şerê cihanê yê yekem dîsa bi rêya rewşenbîrên kurdên li Stenbolê perwerdebûyî hatin kirin.

Di vê xebatê de çavkanîyên sereke, otobîyografîyên rewşenbîrên kurd in -Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa û Nûrî Dersîmî- ku her sê jî li Stenbolê perwerde bûne. Bandora qehwexaneyan a li ser fikrîyata wan a di otobîyografîyan de xwe bi awayekî zelal eşkere dike. Herçend rewşenbîrên serdemê hay ji nasnameyên xwe hebin jî kurdbûn ji bo wan huvîyeta xwe ya polîtîk li Stenbolê wergirtîye. Çalakîyên rewşenbîrên nifşa ewil anku avakarên weşan û sazîyên pêşîn ên li qehwexaneyan hêmana sereke ya vê veguherînê ye.

Rasterast li ser fonksîyon û dîroka civakî ya qehwexaneyên kurd ên Stenbolê lêkolînek tune ye, lê di bîranînên rewşenbîran de bandoreke eşkere ya van qehweyan xwe dide der. Ev xebat dixwaze di jîyana rewşenbîrî ya kurdan de tesîra qehwexaneyan vekole. Di beşa ewil de bi giştî li ser koka qehwexaneyan û rola wan a civakî dê em ê rawestin. Di beşa duyem de hatina qehwexaneyan a Stenbolê, taybetîyên van qehwexaneyan û têkilîya wan bi otorîteyên sîyasî re dê were ravekirin. Di dawîyê de jî qehwexaneyên kurd ên Stenbolê, bandora wan a li ser neteweperwer û rewşenbîrên kurd dê were nîqaşkirin.

### 1. Qehwe û Qehwexane

Orjîna qehweyê Etîyopya ye, bikaranîna wê wek vexwarinê bi rêya Yemenê pêşî derbasî Rojhilata Nêzîk- welatên misilman e, bi şûn de jî seranserê dinyayê ye. Li gor Hattox (1996, r. 9) em nikaribin rasterast behsa dîrokeke teqez bikin

jî di nîveka sedsala 15emîn de li welatên îslamî her kesî dest bi vexwarina qehweyê kir. Qehwe di demeke kurt de li erdnîgarîyeke fireh belav bû tu car nebû vexwarinek ji rêzê. Ji ber vê jî piştî berbelavbûnê bû rojeveke giring; di name, fetwa û rîsaleyan de cih lê hat veqetandin. Çavkanîyên îslamî yên ku derbarê kok û dîroka qehweyê dinivîsin balê dikişînin ser terîqetên Yemenê. Serdemên pêşîn qewhe di nava terîqetên yemenê de berbelav bû, sufîyên terîqetê di zikiran de ji bo hişyarmayîn û zîndetîyê qehwe vedixwarin (Hattox, 1996, r. 10-12).

Agahîyên derbarê têkilîya qehwe û terîqetên Yemenê yên Hattox xwe dispêre berhema *Umdetü's safve fi hilli'l- kahve* ya Ceziri, li gor vê rîsaleyê zanayeke sûfî yê Yemenî ez-Zebhanî (Dawîya sedsala 15emîn) ku di heman demê de karê mictehîdîyê dike û fetwayan dide, ji bo karekî diçe Etîyopyayê û demek li wê derê jîyana xwe derbas dike. Cara ewil qehwe li vê derê dibîne bêyî ku zanibe bo çi tê vexwarin. Dema vedigere Adenê rojekê nexweş dikeve, qehwe vedixwe û baş dibe, bandora qehweyê ya li ser hişyarîyê, zîndebûnê diceribîne. Piştî ku tevî terîqetê dibe, vê vexwarinê di nava wan de jî berbelav dike (Hattox, 1996, r. 12). Di şevên dirêj de yên ku bi îbadet û rîtuelên terîqetê derbas dibûn, qehwe dibû vexwarineke hêsanker ji bo wan. Sûfîyê Yemenî ligel endamtîya terîqetan karên dîtir ên wek ticarîyê dikirin, ji jîyana civakî bi temamî ne dûr bûn. Ev vewxarina li derdorên terîqetan wek sirrekê dihat parastin lêbelê kêm be jî hêdî hêdî derket derveyê Yemenê (Hattox, 1996, r. 67). Piştî ku ji hêla ticarên Yemenî hate îxrackirin qehwe ewil li Rojhilata Navîn, şûnde jî li seranserê cîhanê di demek kurt de berbelav bû.

Herçend çanda vexwarina qehweyê wek parçeyekî ayînên tesewifî derketibe holê jî qehwexaneyan qada giştî ya civakên îslamî sekulerîze kir. Berîya qehwexaneyan civak bêtir li camîyan dihatin cem hev. Ji gund heya taxên bajaran camî navendên sereke yên civakî bûn ji bo misilmanan. Ji bo danûstandinên civakî qehwexane li hember camîyan weke mekanên alternatîf derketin meydanê. Qehwexane jî mîna camîyan qadeke vekirî bûn bo hemû çînên civakî. Ji ber vê yekê serdemên pêşîn qehwexane ji ûlemayê bertekek dît. Dîrokek teqez ji bo vekirina qehweyan tune ye, lê berîya sedsala 16emîn nayên dîtin (Hattox, 1996, r. 68). Qehwexane navendên vexwarina qehweyê bûn, lêbelê fonksîyona sereke ya van deran suhbet bûn. Qehwexane û usûla çêkirina qehweyê şêweya xwe ya ewil li Qahîreyê wergirt, li Stenbolê gihîşt halê xwe yê dawî û dewlemendtir. Adapteyê jîyana civakî ya bajêr bû ku jin û mêr ji hev vediqetandin. Di vê pêvajoyê de fonksîyona xwe ya dînî û mîstîk jî winda kir (David, 2022, r. 114). Vexwarina qehweyê di nava jinan de belav bûbe jî qehwexane mekanên mêran bûn û ev yek hîn berdewam e. Mêr li van deran tên gel hev û demên xwe bi suhbetên cihêreng derbas dikin. Ev yek heta îro jî

berdewam e ku ji bo zilamên kurd mekanên sereke yên hevdîtinan qehwexane ne. Di prosesa dîrokî de veguherînên teşeyî pêk hatibin jî ji hêla karîgerîyê ve rewş neguherîye.

Qehwexane ji destpêk heta demeke dirêj rastî astengîyan hat. Fonksîyona civakîbûnê ya qehwexaneyan, wek vexwarinek li hember qehweyê bi xwe jî hewldanên astengkirinê dianî. Bertekên li hember qehweyê ji du hizban dihat: Ûlema û rayedarên sîyasî. Nîyet û motîvasyon cuda bin jî her du alî jî ji dorhêla ku li derdora qehweyê pêk dihat aciz bûn. Daxwaza astengkirina qehweyê di destpêka berbelavbûna qehweyê de dest pê kir. Cara ewil Emîrê Memlûkan li derdora Kabeyê çend kesan dibîne ku qehweyê vedixwin dema çav bi Emîr dikevin fenera ku li bin rûniştine ditefînin. Ev dîmen bi emîr re endîşeyekê çêdike û dixwaze vê yekê çareser bike. Lijneyekê çêdike da ku derbarê qehweyê de biryarekê bidin. Piştî ku biryara nebaşîya qehweyê tê dayîn li hember qehwefiroşan û vexuran tedbîr tê wergirtin. Li Mekkeyê ceza didin qehwefiroşan, qehweyên li dikanan tên şewitandin (Hattox, 1996, r. 29-30). Derbarê meşrûbûna qehweyê de di nava ûlemayê de gelek nîqaş çêdibin. Di mezheba henîfî de xwarin an jî vexwarinekê bêcan ji bo misilmanan qedexe ye. Li gor hin aliman ji ber ku dendikên qehweyê bi pijandinê dibin mîna komirê divê heram were qebûlkirin. Ji bilî vê jî adeta fîncangerandinê jî şerab bi bîr tîne, ji ber vê jî nayê qebûlkirin (Saraçgil, 2022, r. 26). Biryarên rayedaran xwe dispêrt van nêrînan, lê di esasê xwe de civatên bi rêya qehweyan derdiketin meydanê ji bo xwe wek xeterê didîtin. Mekanên bi vî rengî rasterast ne di bin kontrola rêveberîyan de bûn. Nîqaş, suhbet an jî galegalên li van deran karibûn encamên cuda derxin meydanê. Bo qedexekirina qehwe û qehwexaneyên pê re têkildar, di navbera ûlema û rayedarên sîyasî de hevkarîyeke nixumandî derket holê.

Qehwexane sînorên civakî û ekonomîk ji holê radikirin. Ji ûlema heta yekî bêkar ji alîyê hemû çînên civakî ve dihat bikaranîn (Hattox, 1996, r. 82). Ev rewşa qexwexaneyan bala seyahên rojavayî dikişand. Paşayek li tenişta parsekekî, begek li tenişta hemalekî rûdinîşt, vê dîmenê bandoreke mezin lê kiribû. Helbet qehwexaneyên cuda jî hebûn ku tenê ji beşek mirovan re xizmet dikirin. Carcaran qehwexaneyek biçûk dibû cîranê qehwexaneyeke wisa ku mişterîyên wî elît bûn (Georgeon, 2022, r. 47). Yek ji sedemên sereke yên qedexekirina qehwexaneyan li Dewleta Osmanî ev rewş bû. Dewleteke mîna Osmanî ku ji bo parastina sîstemê midaxeleyê cil û bergan, hesp û siwarîya reayayan dikir, ev nedihat qebûlkirin (Yaşar, 2018, r. 47). Ji ber vê yekê jî gelek caran padişahên Osmanî qehwexane qedexe kirin û ceza dan xwedîyên wan.

Li sedsala nozdehemîn, li împaratorîya Osmanî li qehwexaneyan çay dewsa qehweyê girt. Çayxaneyên wekî qehwexaneyan berbelav bûn û qehwexane jî êdî ji bo mişterîyên xwe pêşkêş kirin. Li gor Georgeon (2022, r. 55) çay bi rêya îranîyên niştecihê Stenbolê û Azerîyên Şîî berbelav bû. Van her du cemaet li bajêr gelek çayxane vekirin. Piştî Şerê 1877-78an koçberên ku hatin bajêr bandorek mezin li ser vê berbelavbûnê kirin. Sedema sereke ya berbelavbûna çayê bihayê wê ye. Dewsa fîncaneke qehweyê 4 şûşe çay dihat vexwarin, vê yekê kir ku gel bêtir nêzî çayê bibin. Ev veguherîn li ser fonksîyona qexwexaneyan guherînek pêk neanî. Qehwexane – herçend êdî bêtir çay bifiroşin jî- dîsa navendên suhbet û civînê bûn.

Qehwexane piştî nîveka sedsala nozdemîn bûn mînakên herî serkeftî yên qada giştî. Qada giştî –public space- ew qad e ku dikare tê de raya giştî çêbe, ev qad bo hemû endamên civakê vekirî ye (Habermas, 2004, r. 95). Di vê peywendîyê de qehwexane jî yek ji mînakên herî baş in ku qada giştî pêk tînin. Li gor Georgeon (2022, r. 68) li dewleta Osmanî behsa “raya giştî” piştî sedsala nîveka nozdehemîn hat kirin. Georgeon qehwexaneyên li dewleta Osmanî piştî camîyan weke navenda sereke ya ragihanê terîf dike. Nîqaşên li vê derê dikin ku ev der bibin navenda ragihanê. Ji ber vê yekê rayedaran timî dixwest qehwexaneyan teftiş bikin. Li gor nezera Georgeon fikrek ji mizgeft yan jî qehwexaneyekê dereng digehe mizgeft yan jî qehwexaeneyeke din. Ji ber vê yekê dînamîka “raya giştî”yeke rasteqîn dernakeve meydanê.

Li gor Habermas (2004, r. 95) “rojname, kovar, radyo û TV” amûrên ragihanê yên qada giştî ne. Li ser raya giştî xwedan bandoreke dîyarker in. Di sedsala 19emîn de piştî ku rojnameyên ewil dest bi weşanê kirin û berbelav bûn li qehwexaneyan jî cihên xwe girtin. Gelek mişterî bes ji bo rojnemeyan diçûn qehwexaneyan. Ji bo kesên ne xwende mele an jî xwendayek bi dengek bilind rojnameyan dixwend. Li gor ankêteke ku berîya şerê cîhanê hatîye çêkirin, li Stenbolê ji sed û bist kesî çil û şeş kes bo rojnameyan diçûn qehwexaneyê (Georgeon, 2022, r. 69). Bi rêya rojnameyan agahîyên aktuel di heman demê de digihîşt girseyeke mezin. Vê yekê li ser geşedana têgehên wek qada giştî û raya giştî bandoreke eşkere kir. Rojevên serdemê ji alîyê girseyeke berfirehtir ve hatin nîqaşkirin. Qeyranên polîtîk ên împaratorîyê tesîra xwe li hemû qismên civakê da hîskirin.

Qehwexane mekanên piralî bûn, suhbetên edebî li van deran dihatin kirin (Hattox, 1996, r. 89). Helbestvan helbestên xwe, meddah çîrokên xwe li vê derê digotin. Tevgerên polîtîk ji bo xebatên rêxistinî û ramanî dîsa qehwexane ji bo xwe wek navend bijartibûn. Di paytexta Osmanî de qehwexane ji alîyê xefîyeyên padişah ve bi domdarî dihatin şopandin, lê di bajarên dîtir ên Osmanî de

qehwexane ji hêla şoreşgeran bi awayekî aktîf dihatin bikaranîn. Qehwexaneyên -an jî cafe -Selanîkê mekanên civînên mixalifan bûn. Li qehwexaneyên derdora Barûya Spî, hîmê Şoreşa Jontirkan hatibû avêtin. Plansazîya şoreşê li van cafeyan dihat kirin (Anastassiadou, 2022, r. 91). Encama sereke ya van çalakîyên qehwexaneyan Şoreşa Meşrûtîyeta 1908an bû.

Rasterast an nerasterast qehwexane di sedsala nozdehemîn de li ser mirovan xwedan hêzeke veguherîner bû. Li gor dîroknûs Muhammed Kurd Alî, qehwexane, piştî nîveka sedsala 19emîn li ser peydabûna bîrewerîya neteweyî ya Ereb tesîr kiribû. Ew, çûnûhatina qehwexaneyan bi qasî civînên klûb û sazîyên edebî yên rewşenbîran ku ji Şam, Beyrût, Humus û Hamayê pêk dihatin, bi qîmet didît. Qehwexane ji bo kesên diçûn nasîna derveyê bû (Deguilhem, 2022, r. 130). Bajarên ku navendên tîcaret an jî reveberîyê bûn ligel kozmopolîtîyên xwe xwedan sîrkûlasyoneke derveyî bûn. Kesên ku ji bo tîcaret an jî fealîyeteke dîtir dihatin bajêr bêhna xwe li qehwexaneyan vedidan. Qehwexane navendên pêrgîhevhatinan bûn. Ji vî alîyî ve qehwexaneyên bajarên mezin bo mirovên jirêzê îmkaneke qismî ya nasîna derveyê dida.

Ne tenê bo dewleta Osmanî li Îranê jî qehwexane dîsa cihê nîqaşên sîyasî ne, heta sedsala 19emîn wek tedbîrên Osmanî li Îranê jî qehwexane bi rêya xefîyeyeyan dihat kontrolkirin. Şah; rêya xefîyeyan, komên edebî û sûfî ku xwedan meyleke sîyasî bûn dişopand (Goushegir, 2022, r. 156). Sekna li hember qehwexaneyan li Rojhilata Navîn kêm zêde weke hev bûn, fonksîyona wan a civakî û sîyasî jî. Ji ber vê yekê jî merhaleyên ku qehwexaneyan derbas kirine dişibin hev.

## 2. Qehwexaneyên Stenbolê

Qehwexaneyên ewil ên Stenbolê di sedsala 16emîn de hatin vekirin. Li gor Peçevî (1981, r. 258) heta sala 962an a hicrî –mîladî 1554- li Stenbolê ne qehwe ne jî qehwexane hebûn. Yekem qehwexaneya li Stenbolê bi rêya du ticarên Sûrî li Tahtakaleyê hat avakirin ku yek ji cihê giring ê tîcareta bajêr bû. Demeke kurt piştî nîveka sedsala 16emîn, li Stenbolê bi sedan qehwexane vebûn.

Li gor Peçevî (1981, r. 258) alim li dij qehwexaneyan radibûn, li gor wan piştî qehwexaneyan kesî berê xwe nedida mizgeftan. Hin miftî dijberîyên xwe yên li hember qehweyê bilindtir kirin û ji ber ku gava dendikên qehweyê dihatin şewitandin dibûn mîna komirê, qehwe heram îlan kirin. Lêbelê qedexe xwe li pêşîya qehwexaneyan nedigirtin. Heta hin kesên di civakê de derdiketin pêş ên wek alim, şêx û heta wezîr; ji bo kara xwe ya maddî qehwexane vekirin (Peçevi, 1981, r. 258-259).

Qehwexane, di demeke kurt de bûn parçeyekî giring ê jîyana civakî. Helbet berîya qehwexaneyan jî mekanên civatan hebûn ku gel wextên xwe li wan deran derbas dikirin. Ji bilî dikanên esnafan mekanên sereke yên civînê bozaxane û meyxane bûn (Özkoçak, 2018, r. 22). Lêbelê qehwe vexwarinek civakî bû. Li derdora wê meclîsên biçûk an mezin bi awayekî xwezayî derdiketin meydanê. Mîna şerabê bandoreke wê ya bêhişkirinê tune bû û mirovek karibû gelek fîncanan vexwe. Suhbet parçeyê herî giring ê van civatên qehwexaneyan bû. Naverokên van suhbetan jî xwedan spekrûmek berfireh bûn, wek mijarên rojane heta rojevên sîyasî ya dewletê.

Dijberîya li hember qehwexaneyan bes ne girêdayî sekna ûlemayê bû. Rayedarên sîyasî jî ev der ji bo xwe wek tehdîdekê. Zilamên ku bi tu karî mijûl nedibûn û wextên xwe bi temamî li Qehwexaneyan derbas dikirin bo îradeya sîyasî endîşeya mixalefeta civakî çêdikir. Dewleta Osmanî bo hebûna xwe berdewamîya struktura tradîsyonel a civakî wek tiştekî heyatî didît. Qehwexane kesên ji statuyên civakî û ekonomîk cuda digihîştandin hev. Elîtên rêveberîyê ji ber vê yekê ji van deran aciz bûn (Yaşar, 2018, r. 47). Wekî din qehwexane wek cihên bêexlaqî û dijberî bawerîya dînî dihatin dîtin (Yaşar, 2018, r. 48). Serdema ku amûrên ragihanê yên girseyî tune bûn qehwexane navendên agahîyan jî bûn. Rayedarên Osmanî qehwexaneyan wek mekanên galegal û paşbêjîyê didîtin, bêmemnûnîyetî li van deran dihatin axaftin û dîsa ev bêmemnûnîyetî li van deran dihatin arastekirin (Özkoçak, 2018, r. 30). Galegalek biçûk jî di encamê de karibû tevgereke girseyî pek bîne.

Qehwexaneyên Stenbolê, di serdemên ewil de wekî sedema gelek arêşeyên civakî dihatin dîtin. Polîtîkayên li hember qehwexaneyan jî li gor rewşa serdemê û sekna padîşahan guherî. Di destpêkê de kontrola li ser qehwexaneyan rasterast qedexekirin bû. Di serdemên Selîmê 2em, Mûratê 3em û Mûratê 4em de hemû qehwexane hatin girtin (Yaşar, 2018, r. 52). Digel vê yekê, qehwexane bi awayekî xefî hebûna xwe domandin. Tedbîrên li hember qehwexaneyan li gor rewşa serdemê guherî, qedexeya giştî dewsa xwe ji cezayên şexsî re hişt. Cezadayîna giştî ya li hember qehwexaneyan, di sedsala 19emîn de, di serdema Mahmûdê 2em de, piştî jiholêrakirina Yenîçerîyan çêbû.

Yenîçerî sedan sal di dewleta Osmanî de hêzên eslî yên leşkerî bûn. Ji xeynî wextên şer nifûsa mezin a Yenîçerîyan li paytext disekinî. Ev sazîya leşkerên ku weke hêzeke elît xizmeta împaratorîyê dikirin di nav çend salan de veguherî, ji bo otorîteya sîyasî wek navendeke hêzê, bû çavkanîya endîşeyeke mezin. Wek navendeke hêzê li ser pêvajoyên sîyasî midaxale dikirin, bo nimûne derbeyên leşkerî, tayîna rayedaran û hwd. Yenîçerîyên ku karê wan tenê leşkerî bû, bi demê re ketin nav fealîyetên dîtir jî. Qedexeya zewacê têk çû û bûn xwedî

malbat. Rewşa ekonomîk a împaratorîyê bû sedema ketina meaşên wan. Ew jî ji bo debara xwe û malbata xwe bikin bi karên dîtir mijûl bûn. Qehwexaneyên Yenîçerîyan jî wek encameke vê prosesê derketin meydanê (Çaksu, 2018, r. 93).

Di destpêka sedsala 19emîn de bi sedan qehwexaneyên Yenîçerîyan hebûn. Girseyên ku li van qehwexaneyan dihatin gel hev derbarê jîyana rojane, rojevên polîtîk de danûstandin dikirin. Nerazîbûna li hember otorîteyê li van deran dihatin bilêvkirin. Qehwexaneyên Yenîçerîyan di demên krîtîk de navendên kombûnê bûn. Çirûska hin serhildanan li van deran hatibûn pêxistin. Di serhildana Patrona Halîl a 1730an, serhildana Kabakçı Mustafa ya 1807an û serhildana dawî ya 1826an de qehwexane bi awayekî aktîf hatin bikaranîn. Piştî jiholêrakirina Yenîçerîyan hemû qehwexaneyên wan hatin hilweşandin û li gor dîroknûsek Osmanî li bajêr ji deh hezarî zehftir qehwexane hatin hilweşandin (Çaksu, 2018, r. 100-101). Piştî hilweşîna van qehwexaneyan cereke din tedbîreke bi vî rengî nehat girtin. Caran xwedîyên qehwxaneyan rastî cezayan bihatina jî êdî rayedarên sîyasî qehwexane bi rêya xefîyeyên xwe dişopandin. Bi taybetî di serdema Abdulhemîdê 2yem de fealîyetên bi vî rengî gurtir bûn (Georgeon, 2022, r. 42). Vê yekê bandora polîtîk a qehwexaneyan sînordar kir, êdî her fikir bi dengek bilind nedihat bilêvkirin û her agahî bi hêsanî nedihat belavkirin.

Qehwexane, li dewleta Osmanî yek ji mekanên sereke yên civînan bûn û gotarên sîyasî li wan deran dihatin avakirin (Kırlı, 2009, r. 18). Ji ber vê yekê rayadarên sîyasî bo çareserîya vê li tedbîrên dîtir digerîyan. Pir kêm be jî qehwexane dîsa carcaran dihatin girtin. Sedema herî giring a girtina qehwexaneyan galegal û paşbêjîyên sîyasî an jî bi tebîra serdemê “Devlet Sohbeti” bû (Kırlı, 2009, r. 21). “Devlet Sohbeti” amaje bi hemû axaftinên derbarê padişah û rayedarên din dikir. Rayedar li hember van galegal û paşbêjîyên sîyasî tund bûn ji ber ku sîyaset di bin monopola hikumdar de bû. Gel derbarê teserûfên otorîteya sîyasî tenê dikaribû îtaet nîşan bide. Nemaze li paytexta împaratorîyê xefîyeyên padişah li her derê di çalakîyê de bûn.

Li gor Kırlı (2009, r. 24-25) qehwexane û qadên giştî yên din ji alîyê hikumdaran ve bi rêya xefîyeyan dihatin raçavkirin. Kesên li hember rêveberîyê mixalefet an jî gotînên nebaş dikirin di cih de bi tundî dihatin ceza didîtin. Piştî 1840î xebatên çavderîya xefîyeyan sîstematîktir bûn, hatin qeydkirin (jûrnal). Çalakîyên xefîyeyan heta wê demê ne domdar bû û ne nîzamî bû, piştî wê salê bû weke karekî domdar û bisîstem. Çalakîyên xefîyeyan paşê jî berdewam kir û di serdema Abdulhemîdê 2em de gihîşt lûtkeyê. Suhbetên civakî bi rêya jûrnalan dihatin qeydkirin, berhevkirin û nirxandin. Nîyeta rayedaran wek berê ne cezakirina mirovan bû, dixwestin rewş û nêrînên civakî hîn bibin. Helbet

kontrola bi rêya xefîyayan di astengkirina mixalefeta civakî de encameke bitesîr derdixist meydanê. Ji ber vê yekê çalakî û rêxistina polîtîk li bajarên ku ji paytextê dûr bûn, dihatin kirin.

Kontrola berdewam a li ser qehwexaneyan her çend li ser naverokên suhbetan tesîr kiribe jî qehwexane dîsa jî ev fonkîyona xwe winda nekirin. Meseleyên civakî dîsa herî zede li van deran dihatin nîqaşkirin. Paytexta Osmanî wek bajarekî kozmopolît gelek milet û cemaetên dînî yên cuda dihewandin. Qehwexaneyên van koman jî ji hev vediqetîyan. Qehwexaneyên taxan li gor cemaeta wê derê diguherî. Bi gelemperî mişterîyên van qehwexaneyan dîsa niştecihên taxê, endamên wê cemaetê bûn. Di jîyana cemaetan de ev qehwexane xwedan rolên giring bûn. Ev der navendên hevdîtin, ragihan û alîkarîyê bûn (Georgeon, 2022, r. 49). Di heman demê de qehwexaneyên kêmaran jî hebûn. Ermenî, rûm, ereb, kurd, ernawid heta neteweperwerên tirk ên ji Rûsya koçî Osmanî bûbûn ji bo xwe qehwexaneyên cuda dîtibûn. Her qehwexane li gor midawîmên xwe xwedan rojevên taybet bûn. Ji bo kurdan qehwexaneyên Stenbolê mekanên sereke yên hevgirtinê bûn, nifûsa li vê derê bi gelemperî koçber bûn û têkilîyên xwe yên pêşîn li van deran pêk dianîn.

## 3. Tesîra Qehwexaneyên Kurdî ya li ser Neteweperwerîya Kurdî

Ji sedsala 19emîn û vir ve li Stenbolê nifûseke mezin a kurdan pêk hatibû, bi taybetî xebatkarên ku ji Kurdistanê hatibûn qismek mezin ê vê nifûsê pêk dianîn. Yek ji sektora sereke ya kurdan hemaltî bû. Girseyeke mezin a kurdên Stenbolê karê hemaltîyê dikir. Lê piştî jiholêrakirina Ocaxa Yenîçerîyan hemalên kurd jî hatin tasfîyekirin. Hemalên kurd û tirk ji loncayan hatin avêtin. Rola wan a serhildana 1826an sedema sereke ya vê biryarê bû, di dewsa wan de hemalên ermenî hatin bicihkirin. Vê yekê heta serdema Ebdulhemîdê duyem berdewam kir. Piştî bûyerên 1896an di dewsa hemalên ermenî de hemalên kurd wergirtin (Alakom, 2012, r. 176-77). Piştî wê salê li Stenbolê nifûseke mezin a hemalên kurd pêk hat. Ji bilî xebatkarên kurd di heman demê de qismek xwendekar jî hebûn. Ev kes, her du beş jî ne ji Stenbolê bûn. Hin ji wan wan tenê bo demeke kurt hatibûn Stenbolê, ev girseya ku bi gelemperî ji zilaman pêk dihat mişterîyên potansîyel ên qehwexaneyan bûn. Wextên ku ji ber kar û xebatê diman, li qehwexaneya derbas dikirin. Li gor Alakom (2012, r. 196) qehwexane ji bo hemalan navendên enformasyonê bûn. Kesên ji welatê xwe dûr, hembajarî û referansên xwe li van deran didîtin. Nûrî Dersîmî (1992, r. 31) qala qehwexaneyeke Dêrsimîyan a li Unkapanî- Erzincanlı Ali Paşa- dike ku her roj bi sedan ameleyên Dersîmî li vê derê dicivîyan.

Ji bilî xwendekar û xebatkaran, li Stenbolê kurdên statuyên wan bilindtir jî hebûn, ev koma elît piştî hilweşîna mîrektîyan li Stenbolê hatibûn bicihkirin.[1] Zarokên malbatên arîstokrat ên ku li Stenbolê nefîkirî bûn, gelemperî di burokrasîya împaratorîyê de cî digirtin. Hin ji wan karmendên jirêzê bin jî karmendên pir payebilind jî hebûn di nava wan de. Zarokên malbatên mezin ên Bedirxanî û Baban, ku berê di rêvebirina herêmên Kurdistanê de cî digirtin hem bi xebatên polîtîk -avakirina komele û sazîyên kurd- hem jî bi xebatên rewşenbîrî –weşangerî- di mobîlîzekirina kurdên Stenbolê de roleke giring leystin. Derbarê têkilîya van kesan û qehwexaneyan de agahî tune ne. Em dizanin ku qehwexane ji alîyê hemû alîyên civakê ve dihatin bikaranîn. Îhtimalek mezin ew jî hin demên xwe li qehwexaneyan derbas dikirin, lêbelê bi taybetî qehwexaneyên kurdan bi kar dianîn an nedianîn em nizanin. Ev kes demeke dirêj li wê derê bi cih bûbûn û têkilîyên wan a bi bajêr, ji kesên ku tenê ji bo demekê ji Kurdistanê hatibûn cuda bûn, Stenbol êdî weke bajarê wan bû. Lêbelê mixalefeta kurdî ya bi tevgera Jontirkan re hevrêtî dikir, dibe ku ji bo fealîyetên xwe qehwexane bi kar anîbin. Di berhemên bîranînê yên serdemê de behsa qehwexaneyan pir kêm in.

Rewşa qehwexaneyên Stenbolê piştî Şoreşa Jontirkan a 1908an veguherî berîya serdema Ebdulhemîdê 2em û qehwexane bi awayekî tund bi rêya xefîyeyên xwe dişopandin. Xebat an suhbetên ku naverokên wan civakî, sîyasî bin li van deran ne mimkun bû. Li qehwexaneyan kesî nikaribû nerazîbûna xwe ya li hember otorîteyê bi lêv bike. Piştî Şoreşa 1908an qehwexaneyan fonksîyoneke sîyasî yê hêja wergirtibû. Ji 1908an heta zivistana 1909an di atmosfera azad de derbarê gelek meseleyên sîyasî de li qehwexaneyan suhbet çêdibûn. Di serhildana 1909an a li hember Jontirkan de qehwexaneyên Fatîhê wek navendên kombûn û ragihanê hatin bikaranîn (Georgeon, 2018, r. 74). Vê fonksîyona polîtîk ji bo qehwexaneyên kurdan heta demeke dirêj dewam kir.

Qehwexaneyên Stenbolê nemaze piştî îlana Meşrûtîyeta 2em ji hêla rewşenbîrên neteweperwerên kurd ve bi awayekî aktîf hatin bikaranîn. Kurdên ku heta wê demê bê sazî bûn di demek kurt de rêxistin bûn û sazîyên pêşîn ava kirin. Sazîya pêşîn a fermî bi navê Kürd Teavün ve Terakkî Cemîyetî (Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurdî) li Stenbolê, di 1908an de vebû (Tunaya, 1988, r. 404). Cemîyet bi heman navî xwedan rojnameyekê bû jî, rojname bi zimanî kurdî û tirkî weşan dikir. Berpirsê rojnameyê Süleymaniyeli Tevfik-Pîremêrd- bû. Tevfik di hejmara ewil de amaje pê dike ku komele dê ji bo pêşxistin, geşedan,

1 Derbarê hilweşîna mîrektîyên serdemê ji bo agahîyên berfirehtir bnr: Jwadieh W. (2012). *Kürt Millîyetçiliğinin Tarihi: Kökenleri ve Gelişimi*. (İsmail Çeken & Alper Duman, Wer.) İstanbul: İletişim (r.117-155)., Bruinnessen, M. V. (2015). *Ağa, Şeyh, Devlet*. (Banu Yalkut, Wer.) İstanbul: İletişim (r. 261-279).

perwerde û çanda kurdî bixebite. (Tevfik, 1985, r. 40) Dîsa heman serdemê li Stenbolê bi navê Kürd Meşrutîyet Mektebî dibistaneke seretayî jî hatibû vekirin (Malmisanij, 2011, r. 77-78). Dikare bê gotin piştî hilweşîna mîrektîyên kurdî cara ewil di serdema Meşrûtîyeta 2em a Osmanî de geşbûneke çandî derket meydanê. Rewşenbîrên serdemê jî xebatên xwe di çarçoveya neteweperwerîyeke çandî de dikirin. Hewldanên seperatîst tune bin jî xebatên wan di pêşerojê de bûn hîmê neteweperwerîya kurdî. Rewşenbîr û aktorên polîtîk ên kurdî piştî Meşrûtîyetê di demeke kurt de rêxistin bûn ku endamên van sazîyan ji bajarên cuda yên Kurdistanê bûn. Dîyar e ku di navbera rewşenbîrên wê demê û berîya Meşrutîyetê de têkilîyek û hevgirtinek heye. Di pêkhatina van têkilîyan de rola qehwexaneyan ne dîyar be jî em dikarin behsa îhtimala vê tesîrê jî bikin, ji ber ku sazîyên ku hatibûn avakirin ji hêla endamên xwe ve curbicur in. Kurdên ku ji hêla zarava, çand û bawerîyê ve ji hev pir cuda bûn di sazîya yekem de hatibûn ligel hev. Heman rewş di qehwexaneyên kurdan ên Stenbolê de jî hebû. Qehwexaneyên Stenbolê di wê serdemê de ji hêla rewşenbîran ve bi taybetî bo du armancan hatin bikaranîn: propaganda û rêxistin.

### 3.1. Propaganda

Kurdên koçber li Stenbolê ligel kom, millet û çandên cuda kurdeyatîyên cuda jî nas kirin. Berîya wê, nasnameya kurdî xwedan wateyeke sînordar bû, bi rêya çalakîyên rewşenbîrên serdemê kurdbûn gihîşt pênaseyeke berfirehtir. Kurd alîyên cuda yên nasnameya xwe li vê derê nas nekiribin jî sînorên cîyawazîyan li vê derê ji holê rakirin. Meşrûtîyet ji bo hemû kêmaran qadeke nû ava kiribû ku ev yek rê li ber geşbûna çandî vedikir. Neteweperwerî, çi çandî çi sîyasî, ji bo hemû kêmaran nemaze di nava xwendekaran de fenomeneke di rewacê de bû. Xwendekarên kurd ên ku ji welat hatibûn yek ji beşa giring a midawîmên qehwexaneyên kurdan bûn. Atmosfera serdemê jî xwendekaran arasteyî neteweperwerîyê dikir. Rewşenbîrên ku otobîyografîyên wan hatine vekolîn destnîşan dikin ku kurdbûn di peywendîya polîtîk de cara pêşîn li qehwexaneyan nas kirin, bêguman propagandayên rewşenbîrên serdemê xwedan tesîreke mezin e.

Xelîl Xeyalî yek ji wan rewşenbîran e ku qehwexane wek qada xebatê bi kar anîne. Xelîl Xeyalî ligel endamtîya sazîyên kurdî li Dibistana Ziraetê ya Halkalîyê mamostetî dikir. Di wextê xwe yê derveyî dibistanê de em dibînin ku li qehwexaneyên kurdan derbarê dîrok û çanda kurdî de ders jî dane. Ekrem Cemîlpaşa, di berhema xwe ya bi navê *Muhtasar Hayatım* de suhbetên Xelîl Xeyalî û bandora wan a li ser xwendekaran wiha tîne ziman:

> Ez ê çend gotinan li ser kurdekî xwedî rih û bi qeys û qerar bibêjim, ku li Stenbolê bi ciddî û bi hêz ders da xwendekarên kurd. Ev kesê ku ez ê qala wî bikim ev e ku kurdê mezin Xelîl Xeyalî Begê Motkayî ye. Vî kesî di ciwanîya xwe de xwendina xwe li Amedê qedandibû. Rewşenbîr û kurdperwerekî dilsoz bû. Kurmancî, zazakî, tirkî, farisî û erebî baş dizanibû. Dikaribû bi fransî bixwîne û binivîse. Em xortên kurd di sala 1909an de li Stenbolê, me ev kesê birûmet nas kir. Wê demê temenê wî ji pêncî zêdetir bû. Xezîneyê Dibistana Ziraetê ya Halkalîyê ya Stenbolê bû. Rojên înê dihat qehwehaneya Dîvanyoluyê ya Dîyarbekirê û em li dora xwe kom dikirin. Wî yê gelek tişt li ser kurdayetîyê, dîroka kurdan, mêranî û rûmeta kurdan bigota. Axaftina wî ya dîrokî, neteweyî û edebî bêdawî bû. Me ciwanan bi eleqe, kêf û heyecaneke mezin li van axaftinan guhdarî kir û hînî gelek tiştan bûn. Vî kesî bîst salan li Stenbolê ders da ciwanên kurd (Cemilpaşa, 2016, r. 28-29).

Tê dîtin Xelîl Xeyalî qehwexane rasterast ji bo propagandayên nasnameyî bi kar dianîn, nemaze dersên xwe bo xwendekarên kurd digotin.  Li gor Ekrem Cemîlpaşa 20 sal ji bo xwendekarên kurd dersên kurdeyatîyê daye, ger em li gor rastîya vê agahîyê tevbigerin dîyar dibe ku berîya Meşrûtîyetê jî qehwexane ji hêla Xeyalî ve ji bo propagandayê hatîye bikaranîn. Tesîra Xelîl Xeyalî ya li ser xwendekaran di berhema Kadrî Cemîlpaşa ya bi navê *Doza Kurdistan, Kürdistan Davası, Kürt Milletinin 60 Seneden Beri Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıratı* de wiha tê qalkirin:

> Di sala 1911an de ez ketim Dibistana Ziraetê ya Halkalîyê ya Alisi. Me li dibistanê bi hevalên kurd ên xwendekar re suhbet dikir û me eleqeyekî kûr nîşanî karûbarên neteweyî dida. Di vê navberê de rêberî û teşwîqkirina Xelîl Xeyalî Beg ku midûrê mektebê ye, hestên me yên neteweyî xurttir kir. Bi hevalbendîya hevalan re me biryar da ku civakeke xwendekar a kurd ava bikin. Min Omer Cemîlpaşa kurê wekîlê Wanê Tevfîk Beg Fuat Temo bi Cerrahzade Zekî yê Dîyarbekirî re bi rojan li mizgefta dibistanê rêziknameya komeleya xwendekaran a bi navê Hêvî saz kir û di sala 1912an de piştî ku destûrnameya pêwist girt û damezrîna Hêvî ragihand." (Cemilpaşa, 2014, r. 42).

Propaganda û çalakîyên Xelîl Xeyalî di encamê de yekem sazîya xwendekaran derxist holê ku Hêvî di heman demê de bi navê Rojî Kurd xwedan kovarekê jî bû ku bi zimanên tirkî û kurdî (kurmancî, soranî) weşan dikir. Propagandaya kurdbûnê ne tenê bi rêya ajîtasyonê bi rêya pêşkeşkirina taybetîyên çandî yên kurdî jî dihat kirin. Qehwexane ji bo xwendekarên

serdemê ji alîyê hestî ve jî pir giring e. Kadrî Cemîlpaşa behsa kurdên ku bi cil û bergên xwe li qehwexaneyê rûdinin dike ku çawa ev yek coşê dide wî:

> Di demeke ku hestên me yên kurdewarîyê dest pê kiribûn, me li qehwexaneya Abdullah Çawişê Erganîyê ku hemwelatîyên Dîyarbekirê piştî derketina ji dibistanê di betlaneyê de dihatin cem hev, di nav hemwelatîyên xwe de wextê xwe derbas dikirin. Di vê navberê de dema em dibînin kurd bi cil û bergên kurdî tên qehweyê, ez bi kêfeke mezin heyranî wan dibim bi coşeke jidil. Nemaze ez pir kêfxweş dibûm dema min didît mamosteyê navdar ê Xwendekarên Nur, Molla Seîd (Bedîuzzeman Seîd-î Nursî), bi helwesta xwe ya spehî û mêrxas, bi şal û şepik, bi desmala xweserbilind digerîya (Cemilpaşa, 2014, r. 36).

Seîdê Kurdî (Nûrsî) dema li Stenbolê ye qehwexaneyên kurdan ên serdemê bi awayekî aktîf bi kar anîne, bi taybetî di prosesa boykota hemalên Kurd[2] a 1908an de di gelek qehwexaneyan de axivîye, bûyer berbelav nebe û tesîrên xerab li ser kurdan neke. Boykota hemalên kurd ku ji bo rêveberîya nû ya Osmanî xeter bû. Li gor Zinar (2022, r. 70) layengirên Kürd Teavün ve Terakkî Cemîyetî gelemperî karkerên lîmanê bûn. Reveberîya Cemîyetê hewl dida giranîya xwe li navendê bi rêya çareserkirina alozîya di navbera kurd-ermenan deyne. Ger Cemîyet di çareserîya vê qeyranê de roleke bitesîr neleyize dê hêza wê were nîqaşkirin. Wekî din dikare tesîreke neyînî li ser meşrûtîyetê bike ku vê yekê berpirsîyarîya cemîyetê zêdetir dikir. Meşrûtîyet ji bo kurdan zemîneke giring ava kiribû ku bikarin bi awayekî eşkere rêxistin bibin û xebatên xwe yên çandî bimeşînin, têkçûna wê xetereyeke mezin a van destketîyan jî bû. Seîdê Kurdî di berhema xwe de ji bo xebatên xwe yên li qehwexaneyan wiha dibêje:

> Nêzî bîst hezar kurdên li Stenbolê, ji ber ku hemmal û xafil û safdil bûn, ez tirsîyam ku yên zalim û mustebid, wan bixapînin û qewmê kurd lekedar bikin. Ez li hemû cîyên kurdan û li qehweyên wan gerîyam û sala par min meşrûtîyetê bi zimanekî ku fêm bikin, ji wan re got. Wiha ku: Îstibdad, zulm û zordestî ye. Û meşrûtîyet jî, edalet û şerîet e (Kurdî, 2013, r. 152)

Meşrûtîyet ji hêla rewşenbîrên kurd ve wek destketîyek mezin ên kurdan didîtin û hewl didan ji bo ku têk neçe, ji bo wê hem bi sazîyên xwe hem jî rewşenbîrên xwe bi hewldanên şexsî hêz didan wê. Propagandayên kurdeyatîyê ku li qehwexaneyan dihatin kirin di heman demê de parçeyekî

[2] Derbarê prosesa boykotê ji bo agahîyên berfirehtir bnr: Zinar, M. (2022). *Said Kürtlüğün Kayıp Risalesi.* İstanbul: Nûbihar (r.70-86)

xebatên rêxistinê bûn jî. Xwendekarên ku endamên sazîyan bûn li van deran kesên cuda jî bi rê dixistin.

### 3.2. Rêxistin

Xwendekarên kurd qehwexane wek klûbên sîyasî bi kar dianîn û hin xebatên xwe yên komeleyê jî li van deran pêk dianîn. Kesên ku li van deran nîqaşên polîtîk dikirin û ji bo nasnameya kurdî dixebitîn, bûn pêşengên Tevgera Neteweyî ya Kurdî. Nûrî Dersîmî (1992, r. 38) tevgera xwendekaran a li qehweyan wiha tîne ziman: "Em ciwanên kurd li Stenbol, Çemberlitaş, Divanyoluyê, li Qehwexaneya Dîyarbekirê kom dibûn û me li ser vê mijarê mizakere dikir. Bêguman armanca kurdîtî û kurdayetîyê bi hemû wateya xwe bi şev û roj li ser me hemûyan tesîr kir". Dîyar e ku li van qehwexaneyan girseyeke giring heye ku serê xwe bi meseleyên civakî diêşînin.

Nûrî Dersîmî bixwe jî wek encameke xebatên rêxistinê tevî Hêvîyê bûye û ji bo komeleyê alîkarîya maddî ji Dêrsîmîyan komkirîye (Dersimi, 1992, r. 32). Nûrî Dersîmî vê yekê di otobîyografîya xwe de wiha tîne ziman:

> Cihê me yê civînê li Unkapani Qehwexaneya Veli Bey bû. Wê demê bi Mehmet Necîp ku xwendekarê Tibbîyeya Leşkerî bû û hevalên wî yên din ên rewşenbîr re li vê derê me hevdû didît. Bi rêya van hevalan li Stenbolê tevî Komeleya Xwendekarên Kurd bûbûm (Dersimi, 1992, r. 32).

Encama sereke ya xebatên rêxistina qehwexaneyan avabûna Hêvî Kürd Talebe Cemiyeti ye ku şûnde hin endamên vê komeleyê li sirgûnê sazîyên dîtir jî ava kirin. Her sê rewşenbîrên kurd (Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa, Nûrî Dersîmî) ku çavkanîya sereke ya vê xebatê ne di otobîyografîyên xwe de balê dikişînin ser qehwexane û xebatên rewşenbîran a li van deran. Di teşegirtina fikrîyata her sê rewşenbîran de jî bandora eşkere ya xebatên rewşenbîran a li qehwexaneyan dîyar dibe.

### Encam

Qehwexane ji peydabûna xwe û vir ve tim bûn navendên nîqaşan. Dorhêla ku li qehwexaneyan derdiket meydanê tim endîşe dida rayedarên sîyasî. Digel qedexe, ceza, çavdêrîyên xefîyeyan yên otorîteyên sîyasî, qehwexane hebûna xwe heta îro domandin. Di hin pêvajoyên dîrokî de qehwexane bi rolên xwe bêtir derketin pêş. Midaxeleya wan a jîyana civakî heta sedsala 19emîn bisînor be jî paşê veguherî û qehwexane bûn qada giştî ya herî bitesîr. Modernbûna kurdan ji ber nebûna otorîteyeke sîyasî ya desthilatdar hilberîna hewldanên rewşenbîrên serdemê bû, entelîjansîyaya kurdî ya modern û neteweperwer a

nifşa pêşîn ji welat dûr, li paytexta Osmanî derket û çalakîyên xwe li vê derê pêk anîn. Di atmosfera Stenbola serdemê de neteweperwerîyê hemû kêmar xistibûn bin bandora xwe, xebatên entelektuel û sîyasî yên her alîyî bi perspektîfeke neteweyî dihatin îcrakirin. Bi Şoreşa 1908an re rewşenbîrên kurd bi rêya sazîyên neteweyî hatin gel hev. Digel xebatên sazî û weşanên wan, xebat û çalakîyên li qehwexaneyan tesîreke mezin li ser geşedana neteweperwerîya kurdî kir. Li alîyekî qehwexane wek dibistanên ramanî bûn, rewşenbîrên neteweperwer li van deran xwendekarên kurd arasteyî bîrewerîya neteweyî dikirin. Li alîyê din ev mekan ji alîyê neteweperwerên kurd ve ji bo rêxistinkirina mirovan dihatin bikaranîn. Di dawîyê de wek encam em dikarin qehwexaneyan wekî yek ji sazîyên giring ên geşedana neteweperwerîya kurdî destnîşan bikin.

## Çavkanî/References

Akyazıcı Özkoçak, S. (2018). Kamusal Alanın Üretim Sürecinde Erken Modern İstanbul Kahvehaneleri. A. Yaşar (Amd.) *Kahve ve Kahvehaneler; Mekân, Sosyalleşme, İktidar,* (19-42). İstanbul: Kitap Yayınevi.

Alakom, R. (2012). *Eski İstanbul Kürtleri*. İstanbul: Avesta.

Anastassiadou, M. (2022). Son Osmanlılar Döneminde Selanik Kahvehaneleri. H. Desmet-Gregoire û F. Georgeon (Ed.). *Doğu'da Kahve ve Kahvehaneler*, (81-92). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Bruinnessen, M. V. (2015). *Ağa, Şeyh, Devlet.* B. Yalkut (Wer.) İstanbul: İletişim.

Cemilpaşa, E. (2016). *Muhtasar Hayatım*. İstanbul: Avesta.

Cemilpaşa, K. (2014). *Doza Kurdistan, Kürdistan Davası, Kürt Milletinin 60 Seneden Beri*

*Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıratı.* İstanbul: Avesta.

Çaksu, A. (2018). 18. Yüzyıl Sonu İstanbul Yeniçeri Kahvehaneleri. A. Yaşar (Amd.) *Kahve ve Kahvehaneler; Mekân, Sosyalleşme, İktidar*, (91-110). İstanbul: Kitap Yayınevi.

David, J. C. (2022). Osmanlı Döneminde Halep'teki Kahvehaneler: Çarşı ve Mahalle Kahvehaneleri. H. Desmet-Gregoire û F. Georgeon (Ed.). *Doğu'da Kahve ve Kahvehaneler*, (114- 128). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Deguilhem, R. (2022). Şam Kahvehaneleri (19. 20. yüzyıl). H. Desmet-Gregoire û F. Georgeon (Ed.). *Doğu'da Kahve ve Kahvehaneler*, (129- 140). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Dersimi, N. (1992). *Dersim'e ve Kürt Milli Mücadelesine Dair Hatıratım*. Ankara: Öz-Ge Yayınları.

Habermas, J. (2004). Kamusal Alan. M. Özbek (Ed.). *Kamusal Alan*, (95-102) İstanbul: Hill Yayın.

Hattox, R. S. (1996). *Kahve ve Kahvehaneler, Bir Toplumsal İçeceğin Yakındoğu'daki Kökenleri.* N. Elhüseyni (Wer.). İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları.

Georgeon, F. (2022). Osmanlı İmparatorluğu'nun Son Döneminde İstanbul Kahvehaneleri. H. Desmet-Gregoire û F. Georgeon (Ed.). *Doğu'da Kahve ve Kahvehaneler*, (40-80). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Goushegir, A. (2022). Safeviler'den Günümüze İran'da Kahve ve Kahvehaneler. H. Desmet-Gregoire û F. Georgeon (Ed.). *Doğu'da Kahve ve Kahvehaneler,* (141- 177). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Jwadieh W. (2012). Kürt Millîyetçiliğinin Tarihi: Kökenleri ve Gelişimi. İ. Çeken & A. Duman (Wer.). İstanbul: İletişim.

Kırlı, C. (2009). *Sultan ve Kamuoyu Osmanlı Modernleşme Sürecinde "Havadis Jurnalleri" (1840-1844).* İstanbul: Türkîye İş Bankası Kültür Yayınları.

Kurdî, S. (2013). *Dersên Civakî*. A. Yıldız, A. Samur & M. Î. X. Amedî (Wer.). İstanbul: Zehra Yayıncılık.

Malmîsanij. (2011). *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936).* İstanbul: Vate.

Peçevi, İ. E. (1981). *Peçevi Tarihi 1*. B.S. Baykal(Amd.). Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları.

Saraçgil, A. (2022). Kahve'nin İstanbul'a Girişi (16. ve 17. Yüzyıllar). H. Desmet-Gregoire û F. Georgeon (Ed.). *Doğu'da Kahve ve Kahvehaneler*, (25-39). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Tevfik. (1998). - . M. E. Bozarslan (Amd.). *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi,* (39- 40) Uppsala: Deng.

Tunaya, T. Z. (1988). *Türkîye'de Sîyasi Partiler: Cild 1, İkinci Meşrutîyet Dönemi 1908- 1918.*İstanbul: Hürrîyet Vakfı.

Yaşar, A. (2018). "Küllîyen Ref"ten "İbreten Li'l Ğayr"e Erken Modern Osmanlı'da Kahvehane Yasaklamaları. A. Yaşar (Amd.) *Kahve ve Kahvehaneler; Mekân, Sosyalleşme, İktidar,* (43-54). İstanbul: Kitap Yayınevi.

Zinar, M. (2022). *Said Kürtlüğün Kayıp Risalesi*. İstanbul: Nûbihar.

## Extended Abstract

Coffeehouses have been one of the most important places of social life in the Middle East since the 16th century. These institutions, which have created serious changes in urban life since their emergence, have never been ordinary meeting places. The emergence of coffeehouses caused concerns among the ruling elite from the very beginning. As a result of this concern, coffeehouses faced bans, obstructions and punishments, but despite all these negativities, they have continued their existence until today. The political and social transformations that emerged in historical processes also had an impact on coffeehouses, causing their limited sphere of influence to expand even further. Since the 19th century, coffeehouses have come to the fore as one of the most influential public spaces. This led to an increase in academic interest in coffeehouses, and with the popularization of the concept of public space in the second half of the 20th century, many studies on coffeehouses have been conducted in the social sciences literature and their effects on social transformation have been discussed. Coffeehouses were meeting centers accessible to everyone. In societies where mass media was limited, people learned about developments in the country and the world through conversations in coffeehouses. This made coffeehouses a center of information and provided a space for intellectuals to express their ideas.

As the capital of the Ottoman Empire, Istanbul hosted the birth of the modern Kurdish intelligentsia in the late 19th century. In 1908, with the declaration of the Constitutional Monarchy, Kurds, like other minorities, organized themselves through associations. In the free atmosphere provided by the Constitutional Monarchy, they addressed Kurdish social problems through publications affiliated to the societies. These societies and publications enabled Kurds to discover their historical, social and cultural differences and to develop a sense of identity. In addition to these political and cultural institutions, Kurdish coffeehouses in Istanbul, like their counterparts around the world, played an important role in the development of national thought. Kurdish

coffeehouses in Istanbul were not only a center of solidarity and contact for Kurds from other provinces, but also a natural propaganda and organizing space for Kurdish intellectuals. In these coffeehouses, Kurds encountered other Kurds from different cities with different dialects, beliefs and cultures. Accordingly, Kurdishness became a more comprehensive expression. The influence of coffeehouses on the development of Kurdish identity is best observed in the autobiographies of the second generation of Kurdish intellectuals. After the 1908 revolution, these intellectuals were students in Istanbul during the Constitutional Monarchy period, and although they were aware of their identity, it was during their student years that it gained a political meaning. In this process of transformation, we clearly see that coffeehouses played an active role.

This study examines the impact of Kurdish coffeehouses in Istanbul on the development of Kurdish nationalism through the narratives of Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa and Nûrî Dersîmî. As a result, it has been observed that Kurdish coffeehouses in Istanbul were used as propaganda and organizing centers by Kurdish intellectuals, and this situation was found to be important places that contributed to the development of Kurdish nationalism.